Bidestveanîna Mafên Netewî
Yên Gelê Kurd Di Çarçoveya
Îranek Demokratîk û
Federal De

Hejmar: 169
22'ê Çiriya Pêşîn 2011
Buha: 150 Tûmen

# Agirî

## PDK Îranê di daxuyaniyekê de terora siyasetvanê Kurd, Meş'el Temo şermezar kir

Duheftînameyek siyasî, civakî, çandî û hunerî ye ku Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî

**Cihgirê Serokê Parlemana** Rûsiyê xwazyarê xweseriya Kurdistanê ye

R: 2

**Serkomarê Firansayê** daxwazkarê zexta zêdetir bo ser Îranê ye

R: 3

**%80 ji qurbaniyên** tecareta mirovan, jin û zarok in

R: 9

# Kunemişk, veşargeha dawîn a dîktatoran



Roja pêncşemî, 20' Çiriya Pêşîn, Civata Netewî ya Lîbiyê nûçeya kuştina Qezafî piştrast kir.

Berdevkê Civata Netewî ya Lîbiyê ragehand ku Qezafî di dema helatinê de bû armanca êrîşa hêzên Natoyê û bi giranî birîndar bû. Piştre li encama giraniya birînên xwe canê xwe ji dest da.

Bi kuştina Qezafî bajarê Sirtê jî hate azad kirin û nîzama wî bi yekcarî hate hiloşandin.

Piştî bilavbûna vê nûçeyê xelkê bajarên cur bi cur ên Lîbiyê bi danîna mozîkên netewî ên xwe dest bi cejn û xweşiyê kirin û ew roj wek rojek dîrokî di jiyana xwe de hesibandin.

Eva jî aqibeta dîktatoran ku kunemişk veşargeha dawîn a wan e.

## NY: Komara Îslamî her sal sedan kesan bi nepenî îdam dike

Rêxistina NY dide zanîn ku li sala borî de pêtirî 300 kes li Îranê de bi awayek nepenî hatine daliqandin. Eve jî li halekê de ye ku rejîma Îranê her sal bi awayek fermî hukmê îdama sedan kesên din jî birêve dibe.

R: 2 →



## Îran îznê nade ku ji bo Sûriye, Hizbullah û Hemasê tu arîşeyek



Kargêrê "Civata Diyarîkirina Qazanc û Berjewendiyên Nîzamê" ragehand ku ew îznê nadin ku ji Sûriye, Hizbullah Û Hemasê re tu arîşeyek pêk were

Muhsin Rezayî Kargêrê "Civata Diyarîkirina Qazanc û Berjewendiyên Nîzamê" li gotûbêja bi kanala Elmenar ya ser bi Hizbullaha Lubnan re ragehand ku Sûriye û Hizbullah û Hemas ji bo Îranê xeta sor in. Ji ber ku ew hêla herî pêşê a cîhana Îslamê li hemberî Îsraîlê ne.

R: 2 →




**Îran di darvekirina** girtiyên siyasî de yekem e

Azad Kurdî

Ligel ku 10'ê Cotmehê ji aliyê Rêxistina Neteweyên Yekgirtî, Lêborîna...

R: 5



**Meş'el Temo bi şehîdbûna xwe** serhildan bi gurrtir kir

Dara Natiq

Bi dirêjahiya dîrokê, gelê Kurd li Kurdistana Sûriyê, bi awayên cur bi cur...

R: 7



**Jin, sembola** xebata aştîxwazane

Rêbwar Fanî

Pêkhênerê xelata Nobel, Alfirêd Nobêl, zanayê zanista Şîmiyê bû ku piştî...

R: 8



**Kesayetiya** Cigerxwîn ji sê hêlên taybetî ve

A: Ceifer Mubeşirniya

Gellek zehmet e ku mirov bikare wesfa Cigerxwîn di nivîsekê de cih bike...

R: 10

Hejmar 169, 22'ê Çiriya Pêşîn 2011

# PDK Îranê di daxuyaniyekê de terora siyasetvanê Kurd, Meş'el Temo şermezar kir

Li gor nûçeyan, Meşe'l Temo, yek ji xebatkarên Kurd yê dijberî hikûmeta Sûriyê, roja 7'ê Çiriya Pêşîn a 2011'an, di mala xwe de li bajarê Qamîşloya Sûriyê, ji aliyê girûpek çekdar ên nenaskirî kete ber destrêjê û hat terorkirin. Meşe'l Temo berdevkê tevgera pêşeroja Kurd li Sûriyê de bû û di pêvajoya serhildana xelkê li dijî hikûmeta Sûriyê de, rolek berbiçavc hebû.

Li gor vê yekê ku Meşe'l Temo heya wan mehên dawî di girtîgeha rejîma Sûriyê de bûye û piştî rizgarbûn ji hepsê jî, yek ji wan kesayetiyan bûye ku pêşniyara "Beşar Esed" li dor amadebûna wî tevî çend partiyên din ên Kurdî de bo got û bêjan li gel rejîma Sûriyê red kiribû. Hemû aliyek berpirsiyariya vê cinayetê dixin stûyê vê hikûmetê.

PDK Îranê tevî nîşandana xem û kederên xwe li hember terora wî xebatkarê Kurd, sersaxiyê dide malbat û hevhizrên Meşe'l Temo, vê kiryara terorîstî şermezar dike û hêvî dixwaze ku îrade û cangorîtiya gelê Kurd, mil bi milê berxwederên din yê Sûriyê, her çiqas zûtir bibe seba hiloşîna hikûmeta dîktaror di wî welatî û anîne serkara desthilatek dilxwaze xelkê ku têde hemû pêkhateyên wî welatî û yek ji wan, xûşk û birayên me ên Kurd bi mafên xwe ên rewa şa bibin.

**Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê**
**Deftera Siyasî**
**08.10.2011'an a Zayînî**
**16.07. 1390'a Rojî**

## Sergotar

### Hatî! Ema era çi?

**Selîm Zencîrî**

Piştî 22 salan Elî xamineyî, rêberê nîzama Komara Îslamî li seferek 10 rojî bo Kirmaşanê, seredana gelek bajar û bajarokên ser bi vê parêzgehê kir û li wir siyaset û helwestên fermî ên Komara Îslamî li dor meseleyên siyasî ên vê dawiyê da zanîn.

Lê armanca li wê seferê li vê dema hesas de çi bû? Gelo dixwast ji rastiyên tal ên wê parêzgehê haydar bibe ku li encama siyasetên wan ên dijî mirovî de derketine holê? Yan na dixwast bizanibe ku çiqas din dikare "sû îstifade" û mifaha xwe ya siyasî ji riya mesebî ve ji xelkê vê Parêzgehê bike? Yan ne mizgîniya avedanî û diyariyek mezin ji bo xelkê pêre bû? Û...hwd.

Parêzgeha Kirmaşanê ji ber pêkhateyên cur bi cur ên ayînî û mesebî ve, tim bûye bi qada cilîdanê, pêxora siyasetên ajawegêrane û zewiyek ji bo çandina tovê netifaqî û dijberiyê bo rejîmê. Bi salan e ku rejîm ji wan ciyawaziyên mesebî zortirîn "sû îstifade" û mifaha siyasî distîne û agirê rikeberî û neyartiyê li navbera xelkê de geş dike. Rejîm bi bizwandina hestên ayînî û mesebî ên xelkê wê çiqas siyasetên tepeserkarane ên xwe pêş bixîne û xelkê wir jî bikin şirîkê hovêtiyên xwe.

We Kirmaşan li cihê berhemanîn û hinartina tovê biratiyê kire nawenda berhemanîn û hinartina nîzamiyan bo deverên din ên Kurdistanê û ji vê riyê ve jî we hesta dujminatiyê li navbera kurdan de çand, çûnku we dixwast Kirmaşanê ji wan deveran veqetînin. Lê gelo ma hewl, xebat û pîlanên we bona guherandina nasnameya netewî û asimîle kirina kurdan giha armanca xwe, heya ku bixwazin bidomînin? Ma we bi domandina vê siyasetê, xincî şer, hejarî, malwêranî, bêkarî, îtiyad, fesad, xwekujî û bi dehan diyardeyên din çi tiştek din ji şêyên Kirmaşanê re kire diyarî ku hûn kewirê dilsojiya wan li sînga xwe didin? Hatî!ema bi çi rûyekê ve?

Li halekê de ku hûn rojane şahidê girtin û binçav kirina rewşenbîr, çalakên çandî û medenî li Kirmaşanê de ne, we rewşek tewaw ewlehî û mîlîtarîstî bi ser parêzgehê de zal kiriye, nemaze baweriya we bi kurdên xapandî jî nahê ku bi salane li xizmet siyasetên we de bûne, belavkirina madeyên hişber û bengdar kirina ciwanan ku ji siyasetên fermî ên we bi taybet li Kirmaşanê de ye, niha ku Kirmaşan li siya siyasetên dijî mirovî û tepeser karane ên we de li xirabtirîn rewşa xwe de ye, hatina we çi manayek heye xincî xwê rijandina ser birînên wan?

Hetmen ji ber nizîkbûna bi hilbijartinên meclîsê ye ku hûn dixwazin bi rakişandina wan bo ser sindoqan, dîsan rewatî û meşrûiyetê bidin xwe? Yan na, renge jî rehmek ketibe dilê we û we bi hewce zanîbe ku li cihê şandina pere û samana xelkê Îranê ji bo girûpên terorîstî, vê carê xelkê Kirmaşanê re bikin diyarî!

Lê êdî mêjdem e ku xelkê Kirmaşanê ji pîlan û kumpiloyên we hesiyane. Êdî soz û durûşmên we tu qîmetê bal wan nake. Êdî ew serdem bi ser çû ku we bi salan berhema "sû îstifadeya" ji pirrengî, pir ayîn û mesebiya Kirmaşanê dixwar, Xelkê Kirmaşanê êdî xwedî ji vê dewlemendiyê derketine û ew yek kirine bi hêvênê yekêtiya netewî û sembola bihevre jiyana aştiyane û şaristanî.

## Şehîdkirina Meş'el Temo, îradeya şoreşvanî a xelkê Kurd li Sûriyê lawaz nake

Piştî nîvroya roja Şemî, 8'ê October, heyetek PDKÎ bi serokatiyê "Mihemed Nezîf Qadirî", endamê Deftera Siyasî a PDKÎ, di merasima sersaxiya Meş'el Temo li bajarê Hewlêrê de beşdarî kir.

Şanda PDKÎ serexweşî û hevxemiya xwe seba terorkirina kesayetiyê naskirî ê Kurd û berdevkê rewta "Elmusteqbel" a Kurd li Sûriyê, bi malbata xwedêjêrazî ragihand.



Di vê civîna seraxiyê de, piştî axaftina "Faris Meş'el", kurê xwedêjêrazî, Meş'el Temo, Mihemed Nezîf Qadirî, bi navê kak Mistefa Hicrî, Sekreterê Giştî ê PDKÎ û Deftera siyasî a Partiyê, xincî mehkûmkirina vê kiryara terorîstî, got: "şehîdbûna Meş'el Temo destpêkek e bo geşekirina zêdetir a xebat û berxwedana têkoşerên Kurd ên Sûriyê û dîktatorên herêmê û yek ji wan, hikûmeta Sûriyê ji bo kursiyên desthilatê ji tu kiryarek hovane xwe naparêzin. Kiryarên han nikarin îradeya şoreşgerane a têkoşerên Kurd li Sûriyê lawaz bike û di encam de, wê bigihîjine azadiyê".

## Cihgirê Serokê Parlemana Rûsiyê xwazyarê xweseriya Kurdistanê ye

Wiladîmîr Jirînûskî, Cihgirê Serokê parlemana Rûsiyê daxuyand: ji ber ku pirsa Xweseriya Kurdistanê yek ji girîngtirîn pirsgirêkên Rojhilata Navîne, di nameyekê de bo Serokkomarê Amerîka, "Nato" û "Yekîtiya Ewropayê", xwazyarê xweseriya Kurdistanê bû.



Li gor rapora "Peyamnêr", Jirînûskî di nameyek resmî de bo Barak Obama, Serokkomarê Amerîkayê, Andir Rasmosên, Sekreterê Giştî yê "Nato" û Hêrman Wan Rompî,Serokê Şêvra "Yekîtiya Ewropayê", gotiye: Kurd mezintirîn netewe di cîhanê de ne ku heya niha dewleta xweser ninin.

Navbirî Kurd bi 40 milyûn kes texmîn kiriye û dgotiye: Mixabin heya niha tu dezgehek dîplomatîk di cîhanê de pirsa Kuran nexistiye ber bas, tevî vê yekê ku di pêxema binecihkirina edaletê di cîhanê de hêzên çend netewî bo deverên cuda cuda hatine şandin, lê heya niha Netewa Kurd weke pirsek veşartî maye. Ev siyasetvanê Rûsî, bi amajekirin bi xebata Kurdan, pêdagirî kir: Veşartî mana pirsa Kurdan û berdewamiya vê rewşê di pêşerojê de Rojhilata Navîn tûşî arîşeyan dike.

## Doma nûçeya: **NY: Komara Îslamî her sal sedan kesan bi nepenî îdam dike**

Ehmed Şehîd, nûçegihanê taybetî ê NY derheq mafên mirovan li Îranê di raporekê de dide zanîn ku ew îdamên nepenî û veşartî li girtîgeha Wekîlabad a Kerecê de hatine encam dayîn û nemaze berevajî yasayên fermî ên Îranêjî, parêzer û malbatên daliqandiyan li dema birêveçûna hukmê îdamê de ji mafê beşdariyê bêpar bûne.

Gorî wê raporê, Îranê îsal bi sedan kesên din bi nepenî îdam kirine. Ehmed Şehîd li rapora xwe de tekez li ser binpêkirina sîstimatîk a mafên mirovan û zêde bûna karesatbar a hejmara îdamkiriyan li Îranê de dike.

Ew herweha dide zanîn serbarê wê ku Îranê peyman û kunwansiyonên navnetewî derheq kesên bin 18 saliyê de wajo kirine, lê pitir ji 100 mehkûmên îdamê kesên bin 18 saliyê pêk tînin.

## Doma nûçeya: **Îran îznê nade ku ji bo Sûriye, Hizbullah û Hemasê tu arîşeyek pêk were**

Navbirî herweha derbarê desthebûna rejîma Îranê di pilana terora balyozê Erebistana Seudî de ragehand: Sedema vê ku Amerîkayê tometek weha li Îranê kiriye, ew e ku Amerîka û Îsraîl dixwazin bi vî awayî xwe ji destê wan arîşe û kêşeyan rizgar bikin ku pêsîra wan girtiye. Navbirî herweha got: "Me tu dijminatiyek bi Erebistanê re nine, û tenê em Erebistanê di warê şêweya riftara wê derheq pirsên pêwendîdar bi nerizayetiyên li Behrîn, Yemen û Sûriyê de rexne dikin".

www.arsivakurdi.org

Hejmar 169, 22'ê Çiriya Pêşîn 2011

# Şik û gumanên êrîşa leşkerî
## bo ser Îranê

A: Tahir Şîr Mohemedî

Barak obama serkoamarê Amerîkayê ragehand ku tewaya vebijêrkan li ser maseyê ne. Xanima Dayan Faynstayn seroka Komîteya Îtilaatiya Senaya Amerîkayê jî ragehand ku Amerîka wê bi Îranê re bikeve ser riyek pirr ji kêşe û alozî. Elî Ekber Salihî wezîrî karê derve ê Îranê jî ragehand ku heke Amerîkayê hêza sîlelêdanê hebe, ew jî dê mistek weha li Amerîkayê bidin ku nekare serê xwe hilîne.

Berpirsyarên Rûsiyê heya niha tu helwestek derbarê dosyeyea terora balyozê Erebistanê ne ragehandine, tenê hine nûçe li rojnameyan dedi vê derbarê de bilav bvûne.

**Karnasek leşkerê: Wê Îran li şer de bidorîne**

Lê karnasên leşkerî û siyasî ên Rusiyê êrîşa Amerîkayê bo ser rejîma Îranê dûr û nizanin. Pavel Felgenhauer lêkolerê leşkerî ê Rûsî dibêje ku renge Amerîka derbek sînordar li rejîma Îranê bixe. Navbirî herweha ragehandiye ku " Îran bi tu awayî nikare li hemberî balafirên şerî ên Amerîkayê de xwe ragire, lê heke bixwaze tola xwe hilîne, bê guman wê êrîşê bikete ser binkeyên leşkerî ên Amerîkayê li Kendawê de.

Bi vî awayî emê şahidê şerek din li herêmê de bin ku dê bibe sedema giran bûna buhayê neftê û ew yek jî wê bi qazanca Rûsiyê be". Li gorî gotina wî karnasê leşkerî, Amerîka dikare hêza Behrî û Esmanî ya Îranê ji nav bibe û di encamê de Îran di şer de wê têk bişkê.

**Rûsiye wê bê alî be**

Pavel Felgenhauer herweha qala vê çendê dike: "Me bi Îranê re sînorê erdî tune ye, lê ji riya behra Xezerê ve em cîranê hevudin in. Lê dîsan jî heke Amerîka êrîşê bikete ser Îranê em nabin aliyek vî şerî. Lê seba vê ku bîr û raya giştî ya Rûsiyê dijî Amerîkayê ye, lewra wê dijî êrîşek weha helwêstê bigrin û ragehandina Rûsiyê pişta Îranê bigre".

Ewkarnasê leşkerî bi bîr tîne ku: " derheq Lîbiyê jî her bi vî awayî bû ku ragehandinên Rûsiyê li hember Amerîkayê de pişta Qezafî digirtin, her çend ku Amerîkayê rolek weha li rûxandina Qezafî de tunebû.

**Îran dê şer bikêşe nav xaka hevalbendên Amerîka de**

Ajdar Girdow yek ji nivîskarên kovara pirsên netewî _ strartijîk, organa "Enstîtuya lêkolînên Stratijîk ser bi Binyata Serkomariya Rûsiyê" di derbarê şer de dibêje: "Ez bixwe ser vê bawerê me ku her tometek divêt were selimandin. Bo mînak di dema bûyera Mîkonosê de dadgeha Alman da selimandin ku rêberên Îranê di terora neyarên xwe de dest hebûe. Lewra heke bê selimandin jî ku terhê terorê rast bûye, dîsan jî dibe em bizanin ku beşek li deshilatdariyê dest di terorê de hebûne ne tewaya deshilatê".

Bi raya navberî vebijêrka êrîşa leşkerî dijî yasayên navnetewî be. Li gorî gotina wî: " her şerek dikare herêmê bi tewahî têk bide bixe nav metersiyek micid de.Îran dikare şer bikêşe nav xaka hevalbendên Amerîkayê wate Azerbaycan, Turkiye, Efxanistan, Îraq û welatên Kendawê".

Ajdar Girdow jî li ser vê bawerê ye ku Rûsiyê bi dijî Amerîkayê helwestê nagre lê xelkê Rûsiyê dijî Amerîkayê ne.

**Îreanê cîranê herî xirap yê başûra Rûsiyê ye**

**Jewgeni Satanowski** serokê " Enstîtuya lêkolînên Rojhilata Navîn" li Moskovayê de dibêje : " li ser bingeha zanyariyên Amerîakayê Îranê dixwast ku balyozxaneyên Îsraîlê jî biteqîne. Lê niha zortir bas ji terhê terora balyozê Erebistanê tê kirin".

Ew karnasê leşkerî rolê Îranê li herêmê de neyînî dinirxîne û dibêje ku Îran cînarê here xirapê Rûsiyê ye û karê Îran berdewam ev e ku kêşeyan li herêmê de pêk bîne.


Jewgeni Satanowski her weha dibêje ku : "Obama ne Corc Buş e ku bikare bi Îranê re şerek dirêdem bike, lê renge ew bona serkevtina li hilbijartinan de dest bi kiryarek weha bike".

Bi raya navbirî heke Amerîka êrîşek weha bi dijî Îranê encam bide bê guman Rûsiyê dê Amerîka û Rojava bi tundî rexne bike, lê Rûsiye wê ji destê programa Etomî a Îranê jî rizgar be.



## Di serê Xamineyî de çi derbas dibe;
### Xamineyî terhek nû heye

Elî Xamineyê rêber û Weliyê Feqîh ê rejîma îstibdadiya zal bi ser welatê me de, di dema sefera bo Kirmaşanê got: " Heke di pêşerojê de em bizanin ku nîzama parlemanî bo hilbijartina berpirsyarên dezgeha Rêveberiyê baştir e, wê demê kêşe nine ku şêweya niha bihê guherîn".




Ew gotina navbirî seba vê yekê ji aliyê karnasan ve giringî pê hate dan ku mehekê berî niha Hemîdreza Katoziyan nûnerê parlementoya rejîma Îranê jî ragehandibû k: " Bi raya karnasên siyasî seba wê ku em xwediyê Wilayeta Feqîh û rêberê payebilind in êdî ne hewce ye ku me serkomar hebe".

Weha xuya ye ku Xamineyî bona guherîna nîzama Komara Îslamî bi Hikumeta Îslamî bîr ji hinek terh û gelaleyan kiribe. Navbirî heyamekê berî niha jî hilbijartina serkomariyê ji nîzamê re wek bûyerek pirr aloz û kêşesaz binav kiribû, lewra renge Xamineyî bîr ji rakirina yekcarî ya posta serkomariyê kiribe û bixwaze bi vî awayî xwe ji destê kesekî ku renge ji aliyê xelkê ve bê hilbijartin û jêre kêşesaz be rehet û asude bike.

Heke ew di ciyê serkomar de tenê serokwezîrekê danên ku ji aliyê parlementoyê ve bê hilbijartin, bê guma wê bikare xwe ji gellek kêşeyan rizgar bike. Jiber ku her demekê serokwezîr bi dilê wî nebe dikare ji riya parlementoya li jêr çavdêriya xwe de wî serokwezîrî jî biguhere.

## Serkomarê Firansayê daxwazkarê zexta
### zêdetir bo ser Îranê ye

Sarkozî serkomarê Fransayê roja sêşemiyê 18'ê Oktoberê ji welatên rojavayî daxwaz kir da ku zextê bixin ser hikumeta Îranê.

Navbirî herweha ragehand ku ew belgeyên dest Amerîkayê ketine nîşan didin ku rejîma Îranê terhê terora balyozê Erebistana Seudî di dest de hebûye.

Wî her weha qala rewşa pirr aloz ya Îranê bi cîranên wê û alîkarînekirina rejîma Îranê di warê programa navikî de kir û daxwzkarê zexta zêdetir bo ser Îranê bû.

Pêştir Sarkozî gef kiribû ku heke Îran bi civaka navnetewî re alîkariyan neke, wê bikeve ber êrîşa leşkerî.




www.arsivakurdi.org

# Dîktatorê biçûk bi kî piştqahîm e?!

Rûken

Li seredana Wezîrê Karê Derve yê Turkiyê bo Sûriyê de, Beşar Esed jê pirsî bû ku gelo hûn dizanin çima hêzên navnetewî ku dijminatiya wan bi Sûriyê re eşkere ye, nikarin tecrubeya xwe ya li Lîbiyê de li Sûriyê de ducarî bikin? Çunku ew bi başî dizanin ku heke yekemîn mûşek li Dîmeşqê bikeve, şeş seetan piştî wê, emê agir berdin Rojhilata Navîn û heta ez dikarim ku tengeyên avê ên cîhanî jî dabixim. Piştre dibêje ku tu weha nefikire ku ez di axavtina xwe de zêderewiyan dikim, biryarderên we û welatên din de bi başî dizanin ku ezê vê axavtina xwe bigehînin cî.

Navbirî herweha ragehand ku Amerîka bi başî jê agehdar e ku me heya tu qasekê alîkariya wan kir bona rûxandina rejîma Sedam Husên, jiber ke me Sedam nedixwast. Amerîka dizane ku heke em bixwazin em dikarin ku li Îraqê de bi hezaran ji serbazên wan bikujin. Lê siyaseta Sûriyê ji derbazbûyî de ew bûye ku tewaya kartên xwe ên zext û givaşan eşkere neke.

Navbirî herweha gef xwarin ku heke her kar û kiryarek şêtane bi dijî Sûriyê bê encamdayîn, bê guman min tenê şeş seet hewce ne, ku bi sedan muşekî veguhêzim bilindahiyên Colan (Gulan)ê,û bi wan muşekan Tilavîvê jî bipêkim.

Navbirî herweha got ku ez dikarim bi riya Hizbullaya Lubnan jî agirekê berdim Îsraîlê ku dezgehên wê ên îstixbaratî qet bîr jî lê nekiribin. Herweha Îran jî wê êrîşê bike ser Gemiyên balafirhilgir ên Amerîka û heta Ewrûpayiyan jî.

Weha diyar e ku Beşar Esed jî wek her dîktatorekî din dixwaze bi wan cure gefxwarinan hem xelkê nerazî li Sûriyê de, û hem jî cîhana derve weha bitirsîne ku amade nebin li ser dijayetîkirinan bi rejîma wî re berdewam bin.

Muemer Qezafî jî dema ku Natoyê êrîşî ser binkeyên wan li Lîbiyê de kir, gef ji wan xwar ku heke êrîşên xwe ranegirin, emê şer bikêşin nav Ewrupa û Behra Medîteraneyê. Herweha rû li deshilatdaran li Ewrupayê de got ku xelkê Lîbiyê, dê êrîşî ser cihê we yê kar, û endamên malbatên we bikin, ji ber ku we êrîşî ser cihê kar ê zarokên me kiriye. Lê me dît ku çawa dawî bi deshilata wî hat.

Hîtler ku bi bilavkirina îdeayên nasyonalîstî, dijî komonîstî û dijberiya bi Cihûyan re, karîbû gellek piştevanan ji xwe re peyda bike, li sala 1933'an de deshilat di Alman de bidestve girt. Wî di pêxema gihîştina bi wan armancan de, desta ji tu cure cînayetan bi taybetî kuştina Cihûyan hilnegirt û herweha kete bîr û hizra vê ku cîhanê dagîr bike û "Rayşa" hezar salî ava bike, lê di daviyê de li hemberî Amerîka û hevalbendên wê de têkşikest û bihostek erd nema ku li ser bijî, lewra neçar ma ku bixwe bi guleyekê daviyê bi jiyana xwe bîne.

Herweha di salên navbera du şerên cîhanî de Mosolînî ku kurê hesinkarekî bû û li dema şerê cîhanî ê yekemîn de karî bigîje pileya Ostiwariyê, ji nerizayetiya xelkê Îtaliyayê mifah sitand û Partiya Faşîzmê pêk anî. Wî dixwast ku meznahî û ezemeta Roma kevnar bo Îtalyayê zindî bike.

Wî li sala 1922'an de karî pileya serokwezîriyê ji paşayê Îtalya wergire û nasnavê Duçê, yan Pêşewa wergire. Li sala 1924'an de wî dest bi sansora çapemeniyan kir, yekîtiyên kedkarî hilweşandin, kedkar ji mafê girevê bê par kirin, partiyên siyasî qedxe kirin, û dest bi pêkanîna polîsê nihênî kir, û li sala 1933'an de wî bi Alman û Japonê re welatên mêhwer pêk anî da ku cîhanê dagîr bikin û di navbera xwe de parve bikin, lê wî jî wek Hîtlêr piştî têkşikana li hemberî Amerîkayê de cih nema ku li ser bijî û mirin bû para wî.

Sedam Husên ku Partiya wî, wate partiya Be's di sala 1968'an de deshilat bidestve girt û bixwe jî di sala 1979'an pêde bi awayek fermî Hesen Elbekir li ser kar avêt, bîr ji deshilatek Be'siyane ya heta hetayî dikir û di vê pêxemê de ji tu cînayetekê wek şer, komkujî, hovîtî û gefên wek Esed xwe neparast. Lê me dît ku deshilata wî ya ku bi zora xwîn û ûrê hatibû ragirtin, piştî êrîşa Amerîka û hevalbendên wî li sala 2003'an de mehekê nekêşa ku herifî û dawî bi deshilata wî hat, û bixwe jî li çalekê de hate dîtin, ku bê deshilatî û tirsê reng û rû pêve nehiştibû.

Yan jî Jeneral Pînoşê ku li sala 1973'an de bi riya derbeyek leşkerî bi dijî Salwador Alinde hate ser kar, û li heyamê deshilatdariya xwe de dest bi komkujiya komonîstan kir, tenê karî 17 salan deshiladariyê bike û li daviyê de li nexweşxaneya leşkerî ya Santiyagoyê de bi rezaletî mir.

Tewaya hewla dîktatoran ew e ku hindî bikarin deshilata xwe bihêz bikin, ew ne tenê pêgeha xwe li navxwe de qahîm û bihêz dikin, belkî ew hewlê didin ku li asta navnetewî de jî bibin bi xwedî hêz û deshilat.

Gihîştina bi armancên îdeolojîk beşek ji armancên dîktatorên sedsala bîstemîn bû. Jiber ku sedsala bîstemîn wek sedsala şerê îdeolojiyan hatiye naskirin. Bo mînak nazîsm li Alman de li pey armancên xwe ên faşîstî, û Îstalînîzim li pey armancên xwe ên Komonîstî bû.

Derbazbûyiya wan dîktatoran nîşan dide ku tu deshilatek ku bi zorê bixwaze bi ser xelkê de hikûmetê bike, nikare xwe li hemberî îradeya gelan de ragire û mehkûm bi jinavçûnê ye.

Lewra Beşar Esed jî ku bêguman baş ji rabihoriya wan dîktatoran agehdar e, dibe bizane ku ew ne bi qasî bavê xwe û ne jî bi qasî Sedam, Hîtler û Mosolînî û Pînoşe, bihêz nine ku bikare bi wan cure gefan cîhana derve û bi taybetî Amerîkayê bitirsîne û bixwaze bandorê li ser morala berxwedanvanên Sûriyê bike.

Herweha nabe jî piştîqahîm bi rejîma Îranê û erbabên xwe li Tehranê de be, ku di rojek weha de bi hewara wî de bihên. Jiber ku rejîma Îranê heya wê demê wê piştgiriya wan bike ku li ser kar in, lê di dawiyê de baş dibe bizanin ku bi tenê ne, û qedera dîktataorên berê çavnihêrê wan e.



## Amerîka: Rejîma Îranê gefek micid e bo ser aştî û ewlehiya navnetewî

Hîlarî Kilînton li hevdîtina bi Soltanê Emanê re, seba hewlên wî bona azadiya sê çiyagerên Amerîkayî sipasiya dewleta Amerîkayê bi wî ragehand.

Navbirî herweha li sar dawî bûyerên girêdayî bi dosyeya terora balyozê Erebistanê bi Soltanê Emnaê re axivî û daxwaza alîkariyan di vê derheqê de kir.




Amerîka rejîma Îranê wek gefek micid bos erewlehiya herêmê dihesibîne û dixwaze ku tehrîmên tund ên abûrî û siyasê bi ser rejîma Îranê de bisepîne, û di vî warî de hewcehî bi alîkariya Emanê jî heye.

Eman û Qeterê pêwendiyên nêzîk bi Îranê re hene, û Emanê li bûyera azadiya her sê çiyagerên Amerîkayî de, navbeynkarî kir û 1.5 milyon dolar jî bo azadiya wan sê çiyageran da Îranê.

# Îran di darvekirina girtiyên siyasî de yekem e



Azad Kurdî

Ligel ku 10'ê Cotmehê ji aliyê Rêxistina Neteweyên Yekgirtî, Lêborîna Navneteweyî (AI) û çendîn saziyên parastina mafên mirov ve di asta navneteweyî de wek 'Roja Xebat Li Dijî Cezayê Darvekirinê' hatiye ragehandin, lê hêj cezayê îdamkirina mirovan di gelek welatên cîhanê bi awayên cuda dimeşe. Di salê de jiyana hezaran mirovan bi rêya cezayê darvekirinê tê standin, li her welatekê jî bi awayekê ew ceza tê rêvebirin. Lê şeklên herî hovane li Îranê tê meşandin, ew jî darvekirin ji ber çavê xelkê û li ser kolan û cadeyan e û ya din jî îdamkirina zarokên jêr 18 saliyê ye.

Zêdeyî deh sala ye ku xebat û hewldan di çarçoveya aksiyonên berfireh di asta navneteweyî de tên encamdan, da ku cezayê darvekirinê di hemû wan welatan de ku tevlî peyman û konvansyonên hiqûqî û parastina mafên mirov nebûne, bê rawestandin.

Lê li gor raporên saziyên navneteweyî yên mafên mirov, hêj di 58 welatên cîhanê de cezayê darvekirinê tê rêvebirin. Di sala derbasbûyî de 2 hezar û 390 xalên darvekirinê li hin welatên cîhanê hatiye meşandin. Ji sedî 95'ê cezayê darvekirinê di welatên Çîn, Îran, Kureya Bakur, Yemen, Erebistana Seûdî û Pakistan û Amerîka de tê rêvebirin. Statîstîk derdixin ku rewş nebaştir e ji salên berê.

Îran di warê rêvebirina cezayê îdamkirinê de piştî Çînê, di rêza duyem di cîh girtiye û tundûtûjî û îdamkirin bûye sembola naskirina wê hikûmetê, lê di darvekirina girtiyên siyasî de li cîhanê yekem e! Herçiqas di Îranê de gelek îdam bi nehênî û veşartî tên rêvebirin û zêde jî bi fermî nayên îlankirin, lê li gor raporên çalakvan û rêxistinên parêzerên mafên mirov, di sala 2010'an de 546 kes li Îranê hatine darvekirin ku tenê 312 xal bi fermî hatine ragehandin. Di sala 1390'an a Rojî de heta niha ku 7 meh jê derbas dibe, 135 kes hatine darvekirin.

**Herî zêde girtiyên siyasî yên Kurd li Îranê tên îdamkirin**

Îdamkirina 4 giritiyên siyasî Mamosta Ferzad Kemanger, Elî Heyderiyan, Şîrîn Elemholî, Ferhad Wekîlî di Gulana sala borî de, hovîtiya herî dawî ya Komara Îslamî bû li dijî girtiyên siyasî û ramanê yên Kurd. Lê mêj sal in li Rojhilatê Kurdistanê ji zarok heta kalan her roj şahidê dîtin û bihîstina nûçeyê darvekirina hevwelatiyên Kurd in, vê yekê bandorek nebaş kiriye ser moral û pîskolojiya hevwelatiyan li Kurdistanê.

Girtiyên siyasî yên Kurd li Îranê berdewam bi sûçên 'Muharibe' (şer ligel xwedê), hevkarî û endambûn di partiyên Kurdî yên opozîsyonê û xebat li dijî ewlekariya welat û hewildan ji bo hilweşandina dewletê, bi cezayê darvekirinê tên mehkûmkirin. Piraniya girtiyên siyasî yên Kurd li Îranê di bin îşkenceyên dijwar de hatine neçarkirin ku îfadeyan bidin. Ji aliyekî din jî girtiyên Kurd di dadgehên ne adilane tên mehkemkirin ku ti serxwebûnek di karê dezgeh û saziyên ser bi Dezgeha Dad a Îranê nayê dîtin û cezayê girtiyên siyasî û ramanê yê Kurd zêde ji aliyê sazî û navendên ewlekarî û leşkerî ve li ser rayedarên dadgehan tê ferzkirin.

Di çend salên borî de zêdeyî 30 girtiyên siyasî yên Kurd li Îranê hatine darvekirin û niha 21 girtiyên siyasî yên Kurd jî li benda îdamê ne. Di 2 mehên borî de heta niha tenê li girtîxaneya Urmiyê 10 Kurd hatine darvekirin.

Gelek pirs di vê derbarê dikevin mejiyê mirov, gelo rêvebirina cezayê darvekirinê ne binpêkirina mafê jiyana mirovan e? Gelo heta çiqas bandora pozîtîv hebûye ser kêmkirina tawanan di civakên de? Gelo îdamkirin çaresiyek lojîkî ye yan meşandina tedbîrên din ên hiqûqî?

Li gor nerîna pisporên hiqûqî û civakî, darvekirina hevwelatiyan bi sûcên cuda, ne tenê nikare pêşiya kêmkirina pirsgirêk û tawanan bigre, belkî di warê pîskolojî û exlaqî de zerarê digehîne jiyana mirov û civakê û nikare wek kiryarek adilane bê hesibandin. Rêbazek tundûtûj e ku tenê morala hevwelatiyan têk dide.

Cezayê darvekirinê herwiha 2 bendên giring ên Danezana Gerdûnî ya Mafên Mirov bi eşkere binpê dike. Benda 3: "Jiyan, azadî û ewlehiya kesanî, mafê her mirovî ye." Û benda 5: "Li tu kesî îşkence û stem nayê kirin, bi kirînên derî mirovanê û rûmetşikên nêzîkayî lê nayê kirin û ceza lê nayê birîn." Li gor van du bendên DGMM, cezayê îdamê tawanek dijî mirovahiyê ye.

Lê mixabin ji ber nebûna tedbîrên pratîkî û çavdêriyek kûr û pêwîst a navneteweyî, hêj Komara Îslamî ya Îranê ligel daxwaz û reaksyonên berdewam ên navendên mafên mirov, li ser rêvebirina îdamkirina hevwelatiyan berdewam e. Cezayek ku dûrî prenîsbên exlaqî, mirovî û civakî û hiqûqî ye.

Lê rayedarên Îranê darvekirinê wek rêzbazek olî di qanûnan de guncandine û dimeşînin û bawer in ku radeya tawanan kêm dike, lê di pratîkê de xuya dibe ku di 33 salên borî de ku ji desthilatdairya wan dibihure, îdamkirina hevwelatiyan zêde bandora nigatîv hebûye heta pozetîv û roj li pey rojê jî kirîz û pirsgirêk kûrtir kirine.




# Pilana terora balyozê Erebistanê û ...

*Bahoz*

Amerîkayê li ser bingeha wan belgeyên ku dest wan ketine, hemwelatiyek Amerîkayî û hevalê wî yê Îranî seba vê ku pîlana terora balyozê Erebistana Seudî darêtine, destbiser kirin û rejîma Îranê wek biryarderê pilana terora han daye naskirin.

Barak Obama serkomarê Amerîkayê û Melik Ebdula paşayê Erebistanê di pêwendiyek telefonî de ragehandin ku divêt bersivek yekparçe ya navnetewî bi wan kesan bihê dan ku berpirsyarê kiryarek bi vî awayî ne.

Lê berpirsyarên rejîmê jî di ciyê vê yekê de ku bi belgeyan biselimînin ku tawanbarkirina Îranê bê bingeh û dûr ji rastiyê ye, lê heya niha tenê ragehandine ku ew kiryarên terorîstî şermezar dikin.

Elî Ekber Salihî, wezîrê karê derve yê Îranê di vê derheqê de ragehandiye ku em amade ne her pirsekê bi sebir û hewseleyek zaf bixin ber lêkolînê û me ji Amerîkayê daxwaz kiriye da ku zanyariyên derheqê vê terorê bilav bikin.

Navbirî her weha di yek ji gotûbêjên xwe de tevî vê yekê ku ragehand ku şoreşa Îslamiya Îranê, şoreşek exlaqî û çandî ye, got: " Gelo me kengê kiryarên wusa encam dane ku eva jî cara duyemîn be? ".

Salihî di demekê de weha bi micidî û bê şerim dibêje ku me tu demekê kar û kiryarên terorîstî encam nedane ku hetanî niha wan bi sedan kes tenê di dervayî welat bi awayên cur bi cur teror kirine, ku di nava wan de em dikarin qala terora Şapûr Bextiyar, kazim Recewî, Dr. Qasimlo û Dr. Şerefkendî bikin ku terora Şerefkendî û dadgehîkirina bikujan li dadgeha Mîkonosê de, derbek giran li hitbar û prestîja rejîmê da, û rûyê rastîn yê terorîzma rejîma Îranê eşkere kir.

Herweha teqandina navenda Cihûyan li 18'ê Tîrmeha 1994'an li Boynis Ayrêsa Arjantînê de ku 85 Cihû têde hatin kuştin û 200 kes jî birîndar bûn, hêla jî dosyeya wê nehatiye daxistin û li gorî belgeyan ew karê terorîstî ji aliyê rejîma Îranê ve hatiye encamdan.

Herweha li 25'ê Hezîrana 1996'an li encama teqandina avahiyekê li Erebistanê de 19 pirsonelên leşkerî ên Amerîkayê hatin kuştin û 372 kes jî birîndar bûn ku destê Hêza Quds ya Îranê di vê terorê de bû.

Ji aliyek din ve nabe em ji bîr bikin dema ku Xamineyî di axavtinek xwe de radigehîne ku Newab Sefewî bû sedem ku ew bikeve nava karê siyasî de, û Newab Sefewî jî di dema xwe de rêberê tevgera bi navê "Fedayiyên Îslama Naba Mihemedî" bû, û wê tevgerê kesên mîna Ehmed Kesrewî, Hejîr, û Rezmara teror kirin. Bê guman ew axavtina tê vê wateyê ku teror û terorperwerî tevlî xwîna nav demarên wan bûye û ew her di destpêkê de bi terorê hatine perwerde kirin û dest hilgirtina ji terorê bi wateya bêçaremana wan e.

Bê guman tenê retkirina wan tawanan bi bê anîna belgeyên mentiqî, ne tenê nikare rejîmê ji vê kirîzê derbas bike, belku dikare zexta li ser rejîmê di asta navnetewî de çend hember bike. Herweha dikare vê îdiayê bide selimandin ku rayedarên rejîmê ku di wan salên dawiyê de pênc karnasên wan yê etomî hatine terorkirin, (herçend ew teror cihê şik û gumanê bûn û li gorî gotina karnasên siyasî karê rejîmê bixwe bûye ) bîr ji tolhildanê dike û naxwaze desta ji kar û kiryarên terorîstî hilgire.

Karnasên siyasî li ser vê bawerê ne ku li encama selimandina rastiya vê îdiayê li dadgehek navnetewî de hem tehrîmên navnetewî li ser Îranê wê tundtir bin, hem rejîm zêdetir ji caran di asta navnetewî de dê îzoletir be, hem jî renge rejîm bikeve ber êrîşek leşkerî ku bê guman dibe bersivderê êrîşek weha tenê rayedarên terorîst ên rejîmê bin ku rê ji bo êrîşek weha xweş kirine, ne tu aliyek din.

www.arsivakurd.org

# Ders û şîretek ji bo pêşerojê



Selîm Zencîrî

Piştî wê ku li hilbijartina parlimanî a 12'ê Hezîranê li Turkiyê de, bilûka ked, demokrasî û azadiyê karî hejmarek berbiçav ji berbijarên xwe biser bixe û bibe wezneyek qurs li perlemana Turkiyê de, hêvî û moralek zaf da kurdan ku ji riya siyasî û aştîxwazane ve bikarin tekez û pêdagiriyê li ser mafên xwe wek netewe bikin.

Lê ew bûyer çiqas ji bal kurdan ve cihê dilxweşî, nîşaneya vegeşîna hizra netewî, yekêtî û serketinê bû, ewqas jî bal turkên şoven û kemalîstan ve nîşaneya tirs û xofê bû. Lewma ketine boseyê û bi biryara dadgehek Turkiyê derheq standina mafê parlemantariyê ji Xetîb Dîcle û serbest bernedana pênc parlemantarên girtî ên din xwestin derbekê ji bilûkê û îradeya dengderên wê bidin û li rastî de ew biryar pêngavek bû li pêxem kêm kirina bandor û tesîra serketina bilûkê.

Li vê çarçoveyê de diviya bilûka ked û demokrasiyê bi li ber çavgirtina rewşa siyasî a Turkiyê û zerfiyeta turkan, xwe ji dana durûşmên mezin û axaftinên tûj û hişk biparastibana, û ji vê derfet û xebata siyasî ku metodek serdemî û cîhan pesend e, baştirîn mifah bo misoger kirina armancên xwe wergirtiban. Lê berevaj, piştî borîna 11 rojan bi ser hilbijartinê de, bilûkê bi nîşaneya nerazîbûn li hember serbest bernedana 6 perlemanterên wan de, siwarê pêlên îhsasatê bû û karvedan û reaksiyonek tund girte pêşberî xwe û baykota parlementoyê kirin.

Her çiqas ger ku ew baykot weke karta givaşê û taktîkek demkurt û tenê li asta ragihandinê de bûya, renge karîba heya qasekê armanca xwe bihingivît, lê direj kirina midehê baykotê, tenê avrijandin li aşê kemalîstan û li qazancê şerxwaz û faşîstên Turkiyê de bû.

Lewma serbarê wê ku di wê heyamê de gelek diyalog û dan û standin li navbera partiya desthilatdar û bilûkê de birêve çûn û gelek aliyan daxwaz ji bilûkê kirin ku hêcetan nedine dest tundajoyan bona dijberî kirina destkevtên bicîhatî û nehiştina fezaya aram û ewle.

Berevaj, parlemanê bikine cih û armanca xebata xwe û li wir kêşeyên xwe çareser bikin. Lê bilûka ked û demokrasiyê her li ser biryara baykotê berdewam bû. Di encam de piştî borîna çar mehan bi ser vê biryarê de, bêy wê ku tu yek ji daxwazên wan bi cih bên, biryara vegerîna bo parlemanê û şikandina baykotê dan.

Her çend ku ew jî biryarek girîng û erênî bû û li gel pêşwaziya aliyên kurdî, turkên aştîxwaz, YE û DYA'ê ber bi rû bû, herweha dikare alîkar be bo aramkirina rewşa deverê û kal kirina seqaya ewlehî û nermbûna zimanê siyasetê li hundurê Turkiyê de; û wekî kurd dibêjin zirar her ji nîvê jî vegere, bi qazanc e. Take qazanca baykotê ew bû ku pirsa Kurd zêdetir bikeve ber bas û bala raya giştî a cîhanê bikişîne ser xwe.

Lê bila em bizanin ka encamên baykotê çi bûn û çiqas karî armancên xwe bihingivît?

Serbarê wê ku merca vegerandina mafê perlemantariya Xetîb Dîcle û serbest bernedana 5 perlemantarên din bi cî nehat, mixabin bû sedema serhildana gelek bûyerên tal ên din, weke:

- Zal kirina fezaya pir ji tirs a mîlîtarîstî û şer bi ser kurdistanê de ku goriyên zaf jî bi dû re hatin.
- Destpêkirina operasiyonan bo ser gund û deverên sînorî û serbarê şehîdbûna zaf hevwelatiyan, zerer û ziyanên madî ên zaf bi rûniştiyên ser sînor gihand û li encam de heya qasekê sarî xiste nava têkiliyên kurdên bakûr û başûr.
- Destpê kirina pêlek berfireh a girtin û binçav kirina endam û şaredarên BDP'ê, ku heya niha çendîn şaredar, bi sedan siyasetvan û çalakên siyasî û bi hezaran endamên BDP' ketine vê boseya girtinê û niha li girtîgehan de ne.
- Serxwebûna demokratîk û Parlemana Kurdistanê ku bi lez û bez li Diyarbekirê hatin ragihandin, bê encam man û niha çarenivîsa wan nexuya ye
- Dîdar û hevdîtinên malbat û parêzeran bi Ocalan re hatin qut kirin û hwd.

Piştî wê ku armancên sereke ên xwe bidest nexistin û biryara vegerê dan, neçar bûn ku sonda yasayî bixwen, ku çavkaniya hemû nehametî û bextreşiyên kurdan e. Ji hêla din ve ew karê wan bû sedem ku li dema sond xwarinê de her yek ji serkomar, serok wezîr, fermanderên arteşê û serokê CHP'ê hola parlemanê bi cî bihêlin û derbek ruhî a din ji peykerê bilûka kurdî bidin.

Herweha li rûniştina duyemîn a bilûkê li parlemantoyê de (5'ê Çiriya Pêşîn), serbarê dijberiya BDP'ê, moleta operasiyon û êrîşa arteşê bo ser sînorên Herêma Kurdistanê bo midehê salekê hat dirêj kirin ku eva jî dibe asteng li hember çareseriya aştiyane û kûrtir kirina kêşeyan lê şîn dibe.

Lê niha ku bilûka kurdî beşdarî parlementoyê bûne, heq e ku ew bûyera ji wan re bibe ceribîn û ders û şîretek ji bo pêşerojê. Niha şûn de bi xwendinek duruşt ji meseleyên siyasî û girtina helwestên rast û pêdagirî li ser xebata siyasî û sivîl, peyama aştî û azadîxwaziya kurdan bi başî bigehînin parlementoyê û raya gişî a Turkan.

Bi taybetî ku hikûmeta Turkiyê mideheke ku xelkê Turkiyê bi meseleya vebûna demokratîk li deverên kurd akincî de mijûl kiriye, lewma her bona ceribandina rastî û nerastiyên niyeta hikûmeta Turkiyê bi nîsbet çareseriya pirsa Kurd, divê li pêvajoya biarmanc gihandina vê piroseyê de hevkar û alîkar bin.

Ji hêlek din ve jî eva serê çend rojan e ku komîsyona darêtina Yasaya nû dest bi kar û xebatên xwe kiriye û biryare ku ew yasa li niviya yekem a sala 2012'an de bê hemwar kirin, lewre divê bi awayek ektîv û çalak li bicih kirina mafên kurdan li destûrê de bixebitin û li pêxem berhem anîna yasayek demokratîk û wekhevî xwaz de ji tu hewlek siyasî xwe neparêzin.

Bi taybetî bi berfireh kirina hewl û bizav û pêwendiyên xwe, zemîne û çarçoveya ji hev têgihîştin, asayiş û azadiyê xweş û berfirehtir bikin.



## Arteşa Turkiyê derbek pirr giran xwar

PKK'ê di êrîşekê de bo ser binkeyên leşkerî ên Tirkiyê derbek giran li arteşê xist.

Di encama êrîşa han bo ser serbazgehên herêm ên bi navê Şikurca, û Yuksîkova li parêzgeaha



Hekarî de 24 kes hatin kuştin û gelek kesên din jî birîndar bûn. Piştî vê êrîşê, arteşa Tirkiyê jî dest bi êrîşek berfireh bi dijî PKK kir û ragehand ku tolhildana me wê pirr giran be û tu kes di vê derheqê de berpirsyar nabe.

Li gorî gotina karnasên warê leşkerî êrîşa han duyemîn êrîşa berfireh û bihêz ya PKK'ê bi dijî dewletê ji sala 1984'an pêve bû. Hêjayî gotinê ye ku ew êrîş ji gellek aliayn ve hate mehkûmkirin, bi taybetî desthilatdarên Başûrê ragihandin ku ew şerê han xizmet bi biratiya Kurd û Turk nake.

## Sûriyê Yekîtiya Ereb bi tundî rexne kir

Piştî vê ku Yekîtiya Ereb daxwazkarê lidarxistina konferansekê bi armanca pêkanîna gotûbêjan di navbera dewleta Sûriyê û neyarên rejîmê de bû, rojnameya "Esewre" nivîsand ku: "Êdî ew yek ne cihê heyrî manê ye ku Yekîtiya Ereb di cihê pêregihîştina bi pirsên hevbeş ên Ereban bûye emrazek nedadperwerane bi armanca pêkanîna ne êminiyan di Sûriyê de". Her weha di vê bilavokê de hatibû nivîsandin ku Yekîtiya Ereb bûye rehîna di destê hêzên mezin ên cîhanî de, û bîr û rayên xwe jî li ser bingeha bîr û hizrên Amerîka û Îsraîlê û hevalbendên wan eşkere dike.

Yekîtita Ereb roja 16'ê Oktoberê bi daxuyaniyekê daxwaza pêkanîna "konferansek netewî ya gotûbêjan" di navbera dewletê û neyarên dewletê de kiribû. Yusif Ehmed Nûnerê Sûriyê di Yekîtiya Ereb de ragehad ku ew biryar tê wateya hebûna pîlanekê bi dijî welatê wî, û ragehand ku girupên terorîstî ên çekdar çavkaniya hebûna kêşeyan û tundûtujiyan di Sûriyê de ne.

Hêjayî gotinê ye ku vê yekîtiyê 15 roj dem jêre diyarî kirin. Renge endametiya Sûriyê di vê yekîtiyê de bê hilawîstin.

# Îxanet li jêr navê Kurdayetiyê



Şehab Xalidî

**R**oja 29'ê Xezelwera sala 1375'an a Rojî (21. 10.1996), 15 salên tewaw bi ser tawana îxanetkarane û dûr ji exlaq û mirovatiyê derheq bi desteyek ji xebakarên PDKÎ re derbas bû. Di rojek han de heft xebatkarên riya azadî û demokrasiyê, heft pêşmergên leheng û qehremanê riya azadî û serbestiya neteweya Kurd, ku di qada xebat û berxwedaniya li hemberî êrîşên berdewam yên rejîma terorîstî û terorîstperwer û dijî Kurd a Komara Îslamî a Îranê de bi dehan û sedan destanrêsiyên mezin û bê mînak afirandibûn, mixabin li gorî pîlaneke îxanetkarane ya "Bizûtneweya Îslamî a Kurdistana Îraqê" li nêzîk bajarê Helebçeyê hatin girtin û radestî rejîma Kurdkuja Komara Îslamiya Îranê hatin kirin û şehîdkirin.

Ew xebatkarên riya azadiyê bi navên: Mihemed Ezîz Qadirî, Erşed Rezayî, Yûnis Mihemed pûr, Mizefer Kazimî, Meirûf Sohrabî, Ednan Îsmaîlî, û Daryûş Îslamdûst, ji wan pêşmergên netirs û cesûr bûn ku derbên dijwar li eniyên şer de li rejîmê xistibûn, û desthilatdarên rejîmê jî bi hêvî bûn ku rojekê bi şehîdkirina wan heyfa xwe bistîne û derbek giran li PDKÎ bide. Lewma ew hêviya dujmin bi hevkarî û îxaneta "Bizûtneweya Îslamiya Kurdistana Îraqê" li gor pîlanek darêtî, ew çend hevalên pêşmerge bi saxî radestî celadên rejîma Îranê hatin kirin.

Yên ku ew pêşmergên PDKÎ radestî rejîma kurdkuj kirin, selimandin ku heya tu qasekî bawerî bi vê Îslamê hene ku ji xwe re kirine emraz bo gihîştina bi armancên xwe ên siyasî, û heya tu astekê bawerî bi vê Kurdatiyê hene ku kevirê vê li singê xwe didin!. Û bê helwestiya rêbertiya Bizûtneweya Îslamiya Kurdistanê jî ne tenê di Îslametiya wan û Kurdperweriya wan de şik û guman pêk anî, belkî zêdetir selmênerê vê rastiyê bû ku ew pîlan bi bê agehdariya kes yan hin kesan li asta rêberiya wan de, nehatiye encam dan.

Ji wan heft kesan ji bilî Daryûş Îslamdûst ku karî xwe li nav lepê celladên rejîma Îranê de rizgar bike û tewaya aliyên vê pîlana îxanetkarane û tirsinokane ya "Bizûtneweya Îslamiya Kurdistana Îraqê" eşkere bike, lê ew çend kesên din mixabin heya wê roja ku hate ragehandin piştî îşkenceyên zaf û bêrehmane hatine îdamkirin, tu kesî bi taybetî jin û zarok, dayk û bav û kes û karên wan tu xeberek ji wan nebûn û heya vê demê êş û azarek bê qas kişandin.

Zarokên wan hertim çav li rê bûn ku rojekê bavê wan were ber derî û bo bîstekê jî be, li himbêza germ ya bavê xwe de aram bigrin û di zarokatiya xwe de hest bi êtîmî û sêvîmanê nekin û carek din dilovanî û germahiya caran vegere malên wan û dawî bi wan hemû hesret û êş û azara wan çend salan bê.

Lê mixabin li jêr sîbera îxaneta bi nav çend çekdarên Misilman de ew hevalên pêşmerge hatin îdamkirin û bi dîtina malbat û hevçeperên xwe şa nebûn.

Ew çend hevalên pêşmerge jî ku bê guman li çeperên şer û berxwedaniyê de selimandibûn ku tu tirsek ji mirinê ninin, û ji bo azadiya Kurdistanê amade ne ku her nirxekê jî bidin, wan jî canê xwe kire goriyê wan armancên ku bi salan bû jêre xebat dikirin. Lewra ew bo heta heta di dilê gelê xwe de vê zindî bimînin û ew kiryara îxanetkarane jî bê guman ji bîra gelê Kurd naçe û bo heta heta vê wek leke û xalek reş li ser eniya encamder û biryarderên wê cînayetê, dê her bimîne.





# Meş'el Temo bi şehîdbûna xwe serhildan bi gurrtir kir



Dara Natiq

Bi dirêjahiya dîrokê, gelê Kurd li Kurdistana Sûriyê, bi awayên cur bi cur û ji aliyê sîstema hakim û totalîtera wî welatî ve tên tepeserkirin û cehda asimîlekirina howiyeta netewî a wan tên dayîn û weke neteweyek bênasname ji mafên xwe yên herî destpêkî hatine bêparkirin û li jêr zulm û zorê de dijîn. Serbarê siyaseta tund û tûjî û terorê, tevgera rizgarîxwaziya Kurd li rojavayê Kurdistanê bi awayekî demokratîk û aştîxwazane, xebat û tekoşîna netewî a xwe bo gihîştin bi mafên berheq ê xwe didomîne.

Îro jî ku pêvajoya bûyeran di Sûriyê de ber bi arasteya destpêkirina qonaxek nû a siyasî ve pêngavan davêje, gelê mafxwaz ê Kurd daxwazkar e weke pêkhateyek sereke di wî welatî de riftar pêre bihê kirin û mafên xwe misoger bike û di çarçoveya sîstemek demokratîk û federal de bi awayek aştîxwazane, di avakirin û îdarekirina welatê de beşdar bin.

Mixabin tevî hemû cehdên aştîxwazane yên gelê Kurd di Sûriyê de, kesên welatparêz, çalakên medenî û xelkê sivîl ê Kurd hertim ji aliyê hêzên serkutker ên rejîma dîktator a Be's ve bi awayek hovane tên kuştin û terorkirin. Her di doma siyaseta teror û reşekujiya dewleta Sûriyê bo ser gelê mafxwaz ê Kurd, roja Înê, 15'ê Rezbera îsal, Meş'el Temo, siyasetvan û rêberê naskirî ê Kurd li Sûriyê û berdevkê pêvajoya "Elmosteqbel" a Kurd di mala xwe de tevî kurê xwe ê biçûk, ji aliyê çend çekdarên ser bi dem û dezgehên serkutker ê rejîma Sûriyê ve canê xwe ji dest da.

Terorkirina Meş'el Temo, siyasetvan û xebatkarê Kurd li Sûriyê, bi nerazîbûnek berfireh a navxweyî û navnetewî re berbirû bû û serhildanek berfireh li tev bajarên Kurdistanê birêve çû. Herwusa bû sedema yekdengî û yekhelwêstiya Kurd di vî para Kurdistanê de û xebat û têkoşîna Kurd kete qonaxek nû de, û xelkê mafxwaz û azadîxwaz ê Kurd li Sûriyê bi herifandin û anînexwara peykerê Hafiz Esed û lidarxistina meşên sedan hezar kesî li bajarên Kurdistanê, car din nefret û bêzariya xwe ji siyaseta teror, hovîtî û tepeseriya rejîma Esed dan eyanê û bi îradeyek hevgirtî û şoreşvanî daxwazkarê hiloşîna rejîma dîktator a Esed û misogerbûna mafên berheq ên xwe bûn. Law û xebatkarên siyasî û ronakbîrên Kurd di parçeyên din ên Kurdistanê û di dereveyî Kurdistanê bi rêkxistina meşên nerazîtiyê li hember parlemanên welatan û balyozxaneyên Sûriyê, ev kiriyara terorîstî a dewleta Sûriyê bi tundî şermezar kirin. Hevdem wilayetên Hevgirtî ê Amerîkayê di helwestekê de, terora Meş'el Temo bi tundî şermezar kir û ragihand ku Beşar Esed, Sûriyê berbi arasteyekî bitirs ve dibe û daxwaz kir ku Esed zûtir dest ji desthilatê berde. Ji aliyekê din ve Yekîtiya Ewropayê bi tundî ew kiryara terorîstî proteste kir.

Eva di demekê de ye ku di heyama heft mehên borî de, ku nerazîtiyên gelên Sûriyê dijî hikûmeta Esed dest pêkiriye, civaka navnetewî bi hegera tepeseriya xelkê nerazî ji aliyê hêzên hikûmeta Sûriyê ve, çendîn cezayên navnetwî dijî wê rejîmê pejirandiye û xwaziyarê destberdana zûtir a Beşar Esed ji desthilatê bûye.

Ji aliyekê din ve "Dêywîd Samoêlz", rojnamevanê Amerîkayî, di nûçeyek taybetî de bo nûçegihaniya "AEP DI" ragihand ku terora Meş'el Temo ji aliyê girûpên çekdar ên "Sipaha Quds" a ser bi Sipaha Pasdaran a Îranê ve hatiye encamdan. Çavkaniya han basê vê çendê dike ku fermandehê wê tîma terorîstî serheng "Qasim Husênî" ye. Di vê meha dawiyê de, hêzekî berçav ji endamên taybet ên Sipaha Quds, ji aliyê Sipaha Pasdaranê ve bo balyozxaneya Îranê li bajarê Şamê hatiye şandin heya ku piştgîriya îtilaatî û lojistîkî ji rejîma Esed bikin bo tepeserkirina neraziyan. Bêguman ezmûna şoreşên vê dawiyê ên herêm bi taybetî di welatên Erebî de, didin eyanê ku siyaseta terorkirina kesên welatparêz û teqekirin li hevwelatiyên sivîl û birêvebirina siyaseta agir û asin ne tenê nikare pêşî ji îradeya xelkê serhildayî û azadîxwaz ên welatê me bigre, belku moralek zêdetir dide xelkê heya ku berengarî desthilatdaran bibin.

Lewma her wek xuya bû ku ew tawana nemirovane a rejîma Be's a Sûriyê derheq bi gelê mafxwaze Kurd ne tenê nebû sedema lawazkirina îradeya azadîxwazane a gelê me di rojava de, belku azadîxwazên Kurd bi îradeyek yekdeng û hevgirtî û micidtir ji caran bi dijî rejîma dîktator a Be'sa Sûriyê raperîn û eva bû hegera bi îlozetirbûna zêdetir a rejîma Beşar Esed di asta cîhanî û herêmî de.



www.arsivakurd.org

# Birçîneman, take pêkola sereke ya hin Îraniyan



Sadiq Vehdanî

Dema ku di sala 1390'an de, dewleta Ehmedînijad pêdagîrî li ser birêvebirina terhê armancdarkirina yaranayan û rêkxistina siyasetên nû ên abûrî ên xwe dikir, renge pêşbîniya rewşa niha ya abûrî û rehetiya welat nedikir.

Rewşek ku givaşek giran xistiye ser milê xelkê Îranê.

"Tewerom" li Îranê di astekê de ye ku xelk hemû hewlên xwe didin ku tenê birçî nemînin. Kalayên bingehîn weke xwarin, bi awayekê bêwêne buha bûne û dahatên xelkê jî di astekê xwar de ye û hevaheng li gel buhayên kalayan nine.

Buhayên kala yên bingehîn bi taybetî tiştên xwarinê di hin mînakan %100 jorde çûne. Her şaneyek hêk 9 hezar tûmen tê firotin, herweha buhayê nan di buhara îsall de nêzîk 3 hember zêde bû. Em bas ji xwarinên sade û hewce dikin û bas ji xwarinên pirr pirotîn weke goşt û xawiyar nakin ku di rastî de kirîna wan bo hinek malbatên Îranî bûye hêviyek.

Gellek caran Ehmedînijad û karbidestên dewleta wî bas ji çalakiyên abûrî ên xwe ji bo gihîştin bi edaleta civakî kirine, lê rewşa abûrî a niha ya Îranê berevajê dirûşmên wan nîşan dide.

Edaleta civakî bi wateya kêmkirina navberên tebeqatî û pêkanîna derfet bo geşekirina abûriya hemû civakê ye. Eva di halekê de ye ku jordeçûna nirxa kalayên bingehîn tu car edaletê pêk nayîne û hebûna "teworom"ê nîşan ji firetirbûna navberên tebeqatî ye. Herweha di projeya kêmkirina navberên tebeqatî, pêragihîştin bi rewşa kedkaran girîngiyek berçav heye, eve di halekê de ye ku teverom çend qas zêde bûye, lê dahatên kedkaran di heyama çend mehên derbasbûyî de weke berê maye û tu hevahengiyek li gel jordeçûna nirxên kalayan tune ye.

Li gor nûtirîn amara "Sendûqa Navnetewî a Pere", welatê Îran di warê teveromê de, di nav 180 welatên cîhanê, di pileya 175'mîn welat cih girtiye. Li gor wan amaran, rewşa abûrî a Îranê heta ji welatên weke Îtyûpî, Angûla û Efxanistan ku tûşî qeyranên abûrî û siyasî ên berfireh bûne jî xirabtir e.

Ji aliyekê din ve bêkarî di Îranê de di heyamê 30 salên derbasbûyî de weke pirsek mezin hatiye hesibandin ku niha di rewşekê gellek xirabtir ji caran e. amara bêkarî zêdetir ji %20 tê nirxandin.

Xincî vê yekê ku diyardeya bêkarî, diyardeyek civakî ye ku bixwe berhemhênerê pirsên cur bi cur ên civakî tê hesibandin, kesên bêkar di Îranê de nikarin hewcehiyên sereke ên xwe berhev kin, û gellek kes di Îranê de tenê hewl didin ku birçî nemînin.

Yek ji dirûşmên dewleta Ehmedînijad di destpêka hatine serkarê wî, dijberî û xebat li dijî gendeliya malî û abûrî bû. Gendeliyên ku ne tenê kêm nebûn û tu dijbriyek li hember wê nehate kirin, belkî ew kesên ku îdeaya xebat li dijî fisadê hebûn, bixwe dest bi diziyek weha kirin ku di 100 salên derbasbûyî di Îranê de tu bedelek tune bû. îxtilasa 3 hezar milyard




dolarî yek ji sedan mînakên van gendeliyan bû.

Eva di halekê de ye ku pirraniya xelkên herêmên bêpar ên Îranê weke Sîstan û Belûçistan û parek ji Kurdistanê, her ku diçe rewşa abûrî û rehetiya wan xirabtir dibe û hemû hewlên wan tenê bidestxistina xwarinek sade ye ku ji birçîtiyê nemirin.

Pirsa girîng ev e ku jordeçûna nirxên kalayên bingehîn weke xwarinan li gel dahatên xelkê hejarê Îranê qet hevaheng nine û berdewamiya rewşa niha, dê karesatên kûr ên mirovî çê bike.

# Jin, sembola xebata aştîxwazane



Rêbwar Fanî

Pêkhênerê xelata Nobel, Alfirêd Nobêl, zanayê zanista Şîmiyê bû ku piştî çêkirina "Dînamît" pereyek zaf bidest xist û bû bi yek ji dewlemendtirîn kesên cîhanê. Navbirî di wesiyetnameya xwe got ku piştî mirina xwe serwetên wî di nav kesên ku pitirîn xizmetê bo zanistên Fîzîk, Şîmî, Edebiyat, Pîzîkî û Solh û aştî dikin, bihê parvekirin.

Xelata Nobel bi taybetî di warê xizmet bi sulh û aştî, girîngiyek taybetî heye.

Vebirina xelata Sulh a Nobel ji aliyê 3 jinên Afrîqayî û Asiyayî, nîşanderê girîngîdana civaka cîhana bi jinên xebatkar e ku bi awayek aştîxwazane di cîhana Sêyemê de, çalakiyên siyasî û medeniyê birêve dibin. Komîteya xelata Nobel ya Sulhê, di dema ragihandina vebirên vê xelatê got: "Mercê gihîştin bi demokrasî û aştiyek paydar, pêkhatina derfetên wekhev bo jin û mêran e, jiber ku beşdariya jinan di çalakiyên cur bi cur dikare li ser hemû aliyên civakê bibandor be"

"Gibûy", Serokkomara Lîbiriya ye ku karî xelata Nobelê bi dest bixe. Komîteya Xelata Nobel a Sulhê, sedema hilbijartina du jinên Lîbiriyayî, çalakiyên wan bo geşepêdan bi xebata aştîxwazane û berevanî ji mafên jinan, herweha rola wê bo dawîanîna şerên navxweyî di vî welatî de ragihand.

"Alin Canson Sîrlîf", jinek din ya Afrîqayî ye ku bi sedema xebatên medenî a wê di welatê Afrîqaya Başûr, kariye xelata Nebel a Sulhê bi dest bixe.

Herweha Komîteya Xelata Sulh a Nobel sedema hilbijartina "Tokil Kirman" a Yemeniyê, rêzdanîn bo xebatên demokrasîxwazane a wê di welatê Yemenê ragihand. "Kirman" yek ji piştevan û çalakên xwenîşandanên demokrasîxwazane a Yemen di sala 2011'an bû ku weke olgûyek bibandor bo jinên din di herêma Rojhilata Navînê hatiye nasîn.

Mijarê herî girîng ev e ku hilbijarina wan jinan, nîşan ji pitansiyela jinan di rêveberiya bizavên medenî û aştîxwazane dide ku jin dikarin di welatên mêrsalar, mafên xwe nas bikin û li hember dîktatoriya wan welatan bisekinin. Herweha rola jin bo cemawerkirina xebat di wan welatan girîngiyek berbiçav heye.

Komîteya Xelata Nobel a Sulhê, yek ji sedemên hilbijartina ew 3 jin, handana jinên din bo beşdarîkirin di çalakiyên medenî û civakî ragihand.

Girîngîdana Komîteya han bi jinan, nîşan ji agahdariya nawendên sivîl ên navnetewî ji rola jin di pêvajoya demokrasîxwazane bû.

Vebirina xelata han ji aliyê ew 3 jinên xebatkar, hêviyek mezin bo jinên din di welatên dîktatorî û hêviya guhertinan di wan welatan bû. Herweha pêkanîna derfetek e ji bo diyarîkirina stratejiya xebatên jinan di pêşerojê ye.



www.arsivakurdi.org

Hejmar 169, 22'ê Çiriya Pêşîn 2011

# Ne serjimêriyên direv, ne jî îdiayên bêbingeh

## Lênihêrînek li dor kirîza bêkariyê di Îranê de



Arif Velezî

Şarezayên warê abûrî di cîhanê de pênaseya bêkariyê bi vî awayî kirine û dibêjin; kesek ku di temenek diyarîkirî, wate di navbera 15 heya 65 saliyê de li dû kar digere û nikare kar peyda bike, bêkar tê hesibandin. Zarok, kesên bitemen, kesên ku çûne leşkeriyê, û herwusa jinên maldar û xwendekar, weke heşîmeta bêkar tên hesibandin.

Li gor pênaseya han Yek ji arîşe û kêşeyên herî mezin ku gefek micid e li ser cîhanê bi giştî û welatên hejar bi taybetî, zêdebûna nirxa bêkariyê ye. Çunkî di çend dehsalên derbasbûyî de bêkarî weke vîroseke bi lez, jiyan ji xelkê gelek welatên hejar û di halê geşeyê de tal kiribû, lê sermayeya welatên dewlemend karîbû bibe sedema pêkanîna gelek kar û derfetên karî di welatên hejar de, lê mixabin niha vîrosa han pêsîra welatên pîşesazî jî girtiye û abûriya wan jî xistiye bin bandora xwe de.

Lê gelo di keş û hewayê abûrî a han de ku cîhan têde derbaz dibe û welatên xwedîhêz û sermayeyên cîhanî têde dinalin, dibe rewşa welatên ku sîstema abûriya wan lawaz û xisar hilgir e, wek Îranê ku cuda ji xirabiya rewşa abûrî, nebûna mudîriyet û hebûna îxtilas û diziyên mezin û xeyalî têde tên kirin, dibe çawan be?

Di rewşek han de li gorî gotina karnasên warê abûriyê û herweha li gorî gotinên nûnerê parêzgeha Îlamê di parlementoya Îranê de nirxa bêkariyê li Îranê pitirî %30 ye. Eva jî bixwe yek ji nîşanên herifîna sîstema abûrî û jinavçûna derfetên karî di îranê de ye. Sîstemek ku berevajiyê hemû cîhanê ye û jinên maldar, kesên ku çûne leşkeriyê, û xwendekaran jî bi xwedî kar dihesibîne.



Bi baweriya gellek karnasan jordeçûna nirxa bêkariyê di îranê de vedigere ser gellek hokarên wek: Zêdebûna bilez a nifûsê di Îranê de, geşenekirina abûriya welat serbarê hebûna çavkaniyên bin erd, guhnedan bi gelaleyên di warê pêkanîna derfetên kar, perwerdekirina nedirusta a hêza pispor û şareza, gelaleya sernekevtî a taybetîkirinê (xisûsîsazî), pêkanîna yasayên ku di gel çalakiyên abûrî hev nagrin, lawaziya pêkhateya bazara kar û... Lê ya sereke, mezaxtina beşek zêde a bûdceya Îranê û çavkaniyên bin erd di riya bi



xeyala xwe hinartina şoreşa Îslamî bo derve û herweha kar û kiryarên terorîstî bi armancên siyasî ye.

Herweha beşek din ji bûdceya welat di riya siyasetên şerxwazane ên xwe bi armanca xweteyar kirin bi çekên komkuj weke çeka etomî bo parastina xwe bikar tîne ku vê yekê ji bandora xwe li ser asta jiyana xelkê welat û herweha nebûna derfetên karî û zêde bûna nirxa bêkariyê kiriye.

Serbarê wê ku Ehmdînijad, serkomarê Îranê gellak caran dirûşma pêkanîna derfetên karî dide û bi taybet di sala derbazbûyî de ragihand ku hikûmeta wî 1 milyon û 500 hezar derfetên karî pêk anîne, lê dîsan jî tu tesîrek li daketina nirxa bêkariyê de nahê xuyakirin û tê pêşbînîkirin ku abûriya Îranê bi rewşek xirabtir berbirû bibe. Eva di demekê de ye ku gellek ji xelkê Îranê ji vê karesata mezin bê xeber in û rejîma Komara Îslamî jî bi keyfa dilê xwe amarên kêm û dûr ji rastî û li gor berjewendiyên xwe radigehîne, ku cihê baweriya xelkê ninin.

Sindûqa Navnetewî a Dirav jî ragehandiye ku di sala 2011'an de, nirxa geşekirina abûriya Îranê, di hemû cîhanê de bi tenê ji çar welatên: Sahilê Ac, bi geşeya nigetîv a %7.5, (ku eva jî bi sedema şerê navxweyî di vî welatî de ye), Yûnan bi geşeye nigetîv a %3, Portoxal bi geşeya nigetîv a %1.5, û Îspaniya bi geşeya nigetîv a %1, baştir e.

Di daviyê de li gorî wan serjimêriyên ku Sindûqa Navnetewî a Dirav û navendên din ên fermî û serbixwe bilav kirine, em digîjne vê encamê ku ne serjimêriyên ku banka Navendî ya Îranê bilav dikin dikare rastiya rewşa xirap ya abûrî ji xelkê veşêre, û ne jî axavtinên bê bingeh û sozên bê kiryar yên Ehmedînijad dikarin xelkê welat ji vê rewşa pirr xirap û karesatbar a abûrî rizgar bike. Take rê, bê guman li ser kar rakirina wê sîstemê ye ku heyamê zêdetir ji sî sala ye li ser dahata netewî û sermayeya xelkê welat ji xwe re koşkên mezin ava kirine û jiyanek rehet pêk anîne.

## %80 ji qurbaniyên tecareta mirovan, jin û zarok in

Li gor nirxandina YNê, salane 2 Milyon û 400 hezar kes dibine qurbaniya tecareta mirovan ku %80 ji wan, jin û zarok in.



Wolfgang, berpirsek bilind yê Wezareta Derveyî Utrîşê tevî ragihandina amara han, vê yekê jî zêde kir ku li gor nirxandina Saziya Navnetewî a Kar, qazanca salane a tecareta nemirovane a mirovan, nêzîk bi 32 Miyard Dolar e, ku ji qaçaxa çek û madeyên hişber jî biqazanctir e.

Gabriyêl Haynrîş, Wezîra jinên Utrîşê di wî warî de ragihand ku zêdetirîn hejmara qurbaniyên qaçaxa mirovan ji jin û zarokên welatên hejar pêk hatine.

## Di şeş mehan de, 7600 Îraniyan ji welatên pêşkevtî daxwaza penaberiyê kirine

Nivîsîngeha "Penaberên NY" ragihand ku di 6 mehên destpêka îsal de, 7600 Îraniyan daxwza penaberiyê kirine.

Amara han li çav sala borî %17 zêdetir bûye.

Ji destpêka îsal de heya niha di seranserê cîhanê de, 198 hezar kes ji welatên cur bi cur daxwaza penaberiyê ji welatên pêşkevtî ên cîhanê kirine ku tê nirxandin ev amar heya dawiya îsal, dê bigihîje 420 hezar kesî.

Di rapora NY hatiye ku Îran



bi hebûna 7500 penaxwazî, 5'mîn welat di cîhanê de ye ku xelkê wê, xwazyarê penaberbûna di welatên pêşkevtî de ne.

# Kesayetiya Cigerxwîn ji sê hêlên taybetî ve

**A: Ceifer Mubeşirniya**

Gellek zehmet e ku mirov bikare wesfa Cigerxwîn di nivîsekê de cih bike. Ji aliyekê ve meznahî, zanayî, şoreşgerî û kesayetiya bilind a wî, ji aliyek din ve jî mirovek ewqas mezin û xwedî rûmet û nav û deng, bê guman mirovên mezin û nivîskarên bihêz ên Kurd û rêvîngên riya Cigerxwîn di nivîsandina li ser wî tiştek negotî di jiyana wî de nehiştine ku mirov pê zêde bike.

Lê weke bîranîn jî be, hewce ye ku bas li ser vî navdarê Kurd bê kirin ku weke sitêrkek geş a esmanê Kurdan di çapemeniya Kurdî de her diçilvile.

Cigerxwîn di dîwana Yekemîn a xwe de "R. 261"ê bi kurtî wuha xwe dide naskirin:

Sala hezar û nehsed û sê
ez hatime dinyayê,
Bi navê Siltan Şêxmûs ez
çêbûme ji dayê.
Heta bûm sêzde salî li
gundê me'y Hesarê,
Jîna xwe min diborand paşê
ji wê me da rê.
Bavê min ê rîsipî xwedî
mirov û rûmet,
Ne mirovekî malgenî bi
namûs û bi xîret.
Ji tengasî, neçarî me ew
gundê xwe berda,
Hatin Amûda rengîn bavê
min zû emir da.
Diya min a belengaz pêncî
salî dilovan,
Salek piştî bavê min ew jî li
wî bû mêvan

Zanabûna Cigerwîn û vijdana paqij a wî nedihişt ku ew ji derdorên xwe bê aga be û ew erkdar kiribû ku kunckol be û bi başî êş û kederên gelê xwe bizane û dengê xwe li hember neheqiya li ser gelê xwe bilind bike.

Wî hewl dida ku belengaziya gelê xwe bixe ser ziman û nav pirtûkan ku cîhan jê haydar be. Lê dema ku ew deng ji dujminan giran dihat û bi givaş, bêparkirin û hepsîkirinê dixwastin zimanê vî girê bidin û dengê wî di qirikê de bifetisînin, êşên girantir û kederên kûrtir diketin dilê Cigerxwîn û wî bi xurttir û bi gurrtir diqîrand.

Dengê bihêz û bibandor yê Cigerxwîn ji xelkê re bû daxwaz, armanc, moral, mêrxasî, berxwedanî û mafxwazî. Lewma heya dawîn nefesên xwe, Cigerxwîn ji gelê xwe re bi wefa derket û bi zanabûna xwe riyên mafxwziyê danîn ber gelê xwe û di riya xurtkirina edebiyat, helbest, ziman, hestên şoreşgerî û pirsên civakî ên Kurdî de, xizmetek mezin bi gelê Kurd kir û ew xizmetên wî pêwendiyek mikul di navbera Cigerxwîn û gelê wî de ji her çar parçeyên Kurditanê çê kir.

Di rastî de jî kêm pirs û arîşeyên gelê Kurd û pirsên din ên civakê hene ku Cigerxwîn bas jê nekiribin.



Ger bihêztirîn taybetmendiya Cigerxwîn helbest û wêjeya Kurdî hatiye zanîn, lê ger mirov li gor taybetmendiyan Cigerxwîn bide naskirin, hewce ye ku jiyana wî di sê beşan de bikeve ber nêrînan.

1. Kar û xebata nivîsandin di warên helbest, dîrok û edebiyatê de ku pêk tê ji vana:

**Dîwanên helbestên Cigerxwîn**

1- Prîşk û Pêtî, 1945 Şam
2- Sewra Azadî, 1954 Şam
3- Kîme Ez? 1973 Beyrûd
4- Ronak, Weşanên Roja Nû 1980 Stokholm
5- Zend-Avista, Weşanên Roja Nû19 Stokholm
6- Sefeq, Weşanên Roja Nû 1982 Stokholm
7- Hêvî, Weşanên Roja Nû 1983 Stockholm
8- Aştî, Weşanxana Kurdistan 1985 Stockholm

**Ziman û Ferheng**

1-Destûra Zimanê kurdî, 1961 Bexda
2- Ferheng, perçê yekem,1962 Bexda
3- Ferheng, perçê diwem,1962 Bexda

**Wergerandin**

Kurd. Basîl Nîkîtîn (Wergerandin)
Mînoriskî (Wergerandin)
Leyla û Mecnûn (Wergerandin)
Ûsiv û Zeleyxe (Wergerandin)
Çîroka xortê Îranî (Wergerandin)
Dewleta Mahabadê (Wergerandin)
Kêferat li ser Kurdistanê, Xalifîn (Wergerandin)
Baqismatê res (Wergerandin)

**Dîrok**

Çend Şoresên kurdên kevnar
Destûra Kurdistanê
Dewleta Eyûbî li Yemenê
Tarîxa benî Eyûb 1. 2. 3

Xêncî xebata nivîsandin û helbestvanî û edebiyata Kurdî, navbirî newestane kar û xebata siyasî jî di pêpxema serbestiya gelê xwe de meşand, weke:

2. **Destpêka karê siyasî yê Cigerxwîn:**

Têkbirina şoreşa Şêx Seîd li sala 1925'an a Zayînî û bûyerên piştî vê şoreşê bi taybetî cinayetên Turkan li hember gelê Kurd, bûn sedem ku hin ji wan şoreşgêran derbasî Sûriyê bûn û li sala 1927'an a Zayînî de komeleyek bi navê "Xayîbûn" ava kirin. Bi avabûna wê komeleyê, Cegerxwîn bo yekemîn car bi fermî dest bi karê siyasî kir û li gor guhertin û rewş û derfetan di wan pêkhateyên jêr de xebata xwe ya siyasî meşandin:

Sala 1927'an endametî di komeleya "Xayîbûn"ê de
Sala 1937-1938' an de vekirin "Nadiyek-Komelak" li bajarê Amûdê ji xortên kurd re
Sala 1946' an Sekreterê Civata Azadî û Yekîtiya Kurd
Sala 1948'an endametî di Partiya Komunîst a Sûryê de
Sala 1954' an ji aliyê partiya Komunîst a Sûryê ve dibe berendamê Perlemana wî welatî
Sala 1957'an avakirina Rêxistina Azadiyê û piştre têkilbûn tevî Partiya Demokrat a Kurd

3. **Êş û kederên ku Cigerxwîn di jiyana xwe de dîtinî û di vê belengaziyê de gihîştin bi vê astê:**

sala 1903'an li gundê Hesarê yê ku dikeve Kurdistana Bakur hat dinê.
Navê wî Şêxmûse kurê Hesenê Mihemedê Mehmûdê Elî bûye.

Qederê wisa hez kir ku Cegerxwîn jiyanek pirr zehmet derbas bike, di temenê 15 saliyê de bavê xwe ji dest da û du sal piştre dayîka wî jî xwatirê yekcarî jê xwast û Cigerxwîn sêwî û bê xwedî ma. Ji naçariyan ji bo domandina jiyanê dest bi şivanî û paletiyê kir. Di temenê 17 saliyê de dest bi xwandina olî kir û li Kurdistana Binxetê, Rojhilat û Başûr bo heyamê 4 salan geriya û gelek qerqeşe û êş û azar dîtin û di vê demî de bû ku ev derd û janên xwe anîn ziman û dest bi nivîsandina helbestan kir.

Wan derd û kederan berçêla Cigerxwîn bernedan û qonax bi qonax di xebata xwe a siyasî de tûşî pirsgirêkên mezin weke dûrxistin, girtin û îhanetpêkirinê bû heya sala 1979'an ji neçariyan berê xwe da welatê Siwêdê û li bajarê Stokholmê akincî bû.

li wir jî bi kul û kovanan re jiya û xerîbiyê nehişt xweşiyê li ser rûyê erdê bibîne û di 22'ê Çiriya Pêşîn a sala 1984'an de li bajarê Stokholmê xwatirê yekcarî ji gelê xwe xwast û çû ser dilovaniya xwe.

www.agirikurdi.org

Hejmar 169, 22'ê Çiriya Pêşîn 2011

# Behmen Qubadî fîlmek bibelge li ser rewşa Sûriyê çê dike



Sînemakerê navdar ê Kurd, Behmen Qubadî, dixwaze fîlmek li ser bûyerên vê dawiyê ên Sûriyê çê bike. Li gor malpera "Fosta", Behmen Qubadî mijûlî çêkirina fîlmek li ser rewşa Sûriyê ye ku wê di BBC World de, bihê bilavkirin.

Naveroka fîlam han li ser meşên xelkê Sûriyê bi giştî û herweha meşên Kurdan di bajarên Kurdakincî de ye.

# Fîlma "Qutabxane" serbarê qedexeya li Îranê, li Efxanistanê kete ser ekranan



Wezîrê zanyarî û çandê yê Efxanistanê ragihand: Îran pêşî ji bilavkirina fîlma "Qutabxane" girtiye, lê em tu sedemek bo pêşîgirtin ji nîşandana wê fîlmê nabînin û wê di Efxanistanê bihê bilavkirin.

Mexdûm Rehîn herweha got ku di Efxanistanê de em tu cara sansorên fîlman pesend nakin.


Çend roj berî niha "Esede Îskender", derhêner û ekterê Efxanî ê fîlma "Qutanxane" ragihandibû ku berpirsatiya "Efxan Fîlm" ku li jêr çavedêriya wezareta Zaniyarî û Çand a Efxanistanê de ye, li ser pêşniyar û destêwerdana berpirsên Îranî, pêşî ji nimayeşa wê fîlmê girtine.

Naveroka fîlma "Qutabxane" li ser azar û îşkenceyên penaberên Efxanî ji aliyê polîsên rejîma Îranê ve hatiye çê kirin.

Hefteya derbasbûyî fîlma han di festîvala payîzî a "Mafê Mirov" di bajarê Heratê hatibû nîşandan ku çend berpirsên konsûlgerî ên Îranê jî di wê salonê de amade bûn û bi nîşandana wê fîlmê salon bi cih hiştin.

# Pirtûkek nû bi pirtûkxaneya Kurdî ve zêde bû





Pirtûkek nû li jêr navê "rewşenbîrê Netewî"ji nivîsîna Muradxan Evrîkî li 176 rûpelan de hate çap û bilavkirin ku naveroka wê pêk hatiye ji nivîsek li ser hewcehiya yekîtiya netewî, û demokrasiya di nav PDKÎ û herweha terora şehîd Dr. Qasimlo û helbestên netewî û şoreşgerî. Nivîskar, pirtûka han diyarî şehîd Qasimlo kiriye.

Em wek desteya weşana Agirî destxweşiyê dibêjne birêz Muradxan Evrîkî û hêviya serkevtin û berdewamiyê jêre dixwazin.

## Tu li esmanan bûyî Stêrkek

## (Bi helkefta şehîdketina Meş'el Temo)



Besam Mistefa

**Mêrxaso!**
**Li esmanên sahî bûyî stêrkek**
**Li deşta Sirûcê**
**Li qeraxa çemê Efrînê**
**Li Dêrik, li Qamişloka**
**birîndar û Amûda şewatan..**

**Bûyî gulek!**
**Bi xwînê, xwîna xweyî sor û çirûskdar**
**Xwîna xweyî bi hilm û germ**
**Di dilan de, te nexşeyek kola!**
**Te bi xwîna xwe ya mezin**
**Xewneke mezin**
**Hêviyeke mezin**
**Sozeke mezin da me û te bar kir...**
**Û...**
**Tu li esmanên sahî bûyî stêrkek.**

## LÎSTİKÊN BÊBEXTANE



Mehmet Çobanoglu

Ax bi vê roja reş be, agir ser me direşe
Gulên me jî weşîyan dilan de xwîn dikişe
Li me dîsa bager, duman derbaznabe tofane
Roj bo me ne tu roje, her gav qetrane, mije
Dil jî me qet qete bû, canê me nerehete
Welatê me diheje ev ne bext ne pelîse
Li me bu bager, duman, tofan derbaznabe
Neberf û neşilî ye, lîstikên bêbextane
Ax dîsa me bû xezab, risvayin neyarane
Tim diberizin li me, ji qet me venagerin
Ma ev derd, kul nebese? roj'a nebaş tu here
Em rabûn dijrabûne, gelên me wek şêranin
Ax bi vê roja reş be, agir ser me direşe
Bi sedema vê demê Tirk'in, Fars'in, Ereb'in
Devê wan jî kefşîlin wawîk, gurin, keftarin
Berxwedana gelê me dijrabûna Kurda ye
Ax bi vê roja reş be, agir ser me direşe
Tank û topin, gulene, balafirin, saroxin
Em natewin, nakevin roja reş biecîbe
Dilê me ronahîye navde jî Kurdîstan'e

www.arsivakurdi.org


# Agirî

Duheftînameyek siyasî, civakî, çandî û hunerî ye
Ku Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê diweşîne

www.kurdistanmedia.com/kurdi
Navenda bingehîn ya xebata Agirî li Kurdistanê ye.
Navnîşana derveyî welat:
AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE
E - Mail: agiri2003@hotmail.com
agiri2003@gmail.com, rojnamaagiri@gmail.com




## Pirtûka "Demokrasî li nêrîna Dr. Qasimlo ve" çap û belav bû




Endamê PDKÎ li Norwejê, Elî Munezemî ku xwendekarê masterê li riştêya zanistên siyasî de ye, bo têza xwe û berevanî ji maseteriya xwe dikewe hizra nivîsîn û lêkolîn kirin li ser demokrasiyê ji nêrîna Dr. Qasimlo ve. Lewma li amadekirina vê pirtûkê de serdana gelek kes û aliyên şareza li ser kesatiya Dr. Qasimlo dike û zaniyariyên hewce ji gelek dost û hevalên wî rêberî re bidest dixe.

Paşan bi mandîbûnek zaf, pirtûkê bi îngilîzî amade dike û gelek mamosta û pisporên naskirî jî, pêdeçûna pirtûka wî kirine. Paşan kompaniyek Almanî erkê çapkirina vê pirtûkê digre stûyê xwe.

Kek Elî li vê derheqê de li daxuyaniyekê de ragihand ku ez keyfxweş im ku min kariye dilopek ji behr û deryaya nêrîn û ramanên şehîd Dr.Qasimlo pêşkêşî xwendevan û evîndarên wî bikim.

Em jî ji aliyê weşana Agirî ve, tevî destxweşî kirin ji kek Elî Munezemî, hêviya serketinê jêre dixwazin û herweha hêvî dikin ku mînaka xwendekarên wekî kek Elî zêde û zor bin.

## Tecareta karbidestên Îranî bi Kartelên madeyên hişber ên Mekzîkî re berdewam e

Pêka gotinên Sibastiyan Rotêla, ji nawenda lêkolînên Amerîkayê ( Piro Pablîka), şane û tîmên terora Tehranê li hemû welatên Amerîkaya Nawendî û Başûr ku nawendên madeyên bêhişker in, çalakin û li Arjantîn, Paragoê û Birizîlê de, Îranî tevî Hizbulahiyan bi bazerganiya Gangisterî û mafyayî ve mijûl in heya ku bikarin serbarê dorpêçan, ticareta bi milyonî a xwe jî bidomînin.

Pilana teror kirina balyozê Erebistanê li Waşingtonê de, nîşan dide ku Komara Îslamî a Îranê bi Spaha Quds û Hizbulaha



Lubnanê re gelek bi xurtî çalakin. Ew her weha dide zanîn ku pêka belge û weneyên bidest ketî ji hêla Nawenda dijî Madeyên hişber ve, derdikewe ku karbidestên Îranê pêwendî û hevkariyên xurt bi kartelên Mikzîkî hene, herweha çekên dizyayî ji Îranê jî dixin xizmeta wan de.

## Jina ciwan a Vîtnamî bi xwerinek deryayî ji nişkîve bû pîrejin

### Piştî wê bûyerê, hevjînê wê dişibe neviyê wê



Pir caran li fîlm yan li pirtûkên çîrokan de mirov ecayib û sosretên zeman dibîne û dibîse, lê evcar rastiye ne çîvanok.

Bûyera guherîna rûçikê "Nigwîn Tay Fûng", ew jina ciwan a Vîtnamî ku bi xwerinek deryayî sê heya çar hemberî temenê xwe xuya dike, mirov tûşî şokê dike. Mijara han eva serê mehekê ye ku ne tenê pizîşkên wî welatî bi xwe ve mijûl kirine, belkî herweha bala nawendên îlmî ên navnetewî jî kişandiye ser xwe.

Jina han 26 salî ye û gava li rex hevjînê xwe disekine, mirov wusa dizane ku ew bal neviyê xwe rawestaye. Wê li sala 2008'an xwerinek deryayî xwaribû. Piştî wê hîs dike ku ser û çav û rûmetê wê diperçive8diwerime). Lê ji ber destkurtiyê nikare gelek serdana nojdaran bike û tenê bi dermanên giyahî îqna dike. Lê paşan ji nişkîve ew rûçikê wê geşatiya xwe jidest dide. Di encam de riya bi salan a kaltiyê li demekê de pîva û bûye pîrikek rûmet qermiçî û tejî kurîşk.

## Selehşûr: Sînemaya Îranê fahişexane ye!!



Li pey axaftina Ferecula Selehşûr, derhênerê fîlma Yûsif Pêxember ku sînemaya Îranê bi fahişexane dabû zanîn, 5 ekterên jin ên binav û denge sînemaya Îranê di nameyek hevbeş de bersiva wî dan. Wan daye zanîn, eva ku em dibînin hûn jiyana pêxemberan li warên cur bi cur de dikişînin ser teswîrê û akar û reftarên wan dikin ûlgû û mînak ji xwe re, lê em gelek xembarin ku nekariye tesîrekê li axaftin û kelamên we de bike.


Li encam de, em bi ew nav û dengiya ku we bi nifret, kîn û sivikatîkirin bi hevpîşeyên xwe de bidest xistiye, pir xembarin.

Hêjayê gotinê ye ku navhatî sînemakarên jin ên Îranê wekê Ancilîna Cûlî û sînemaya Îranê jî bi fahişexane dabûn nasîn. Li gor wî, çunku sînemakarên jin ên Îranî wêneyên xwe li ser înternêtê belav dikin, her wekî Ancilîna Cûliyê tên dîtin.

## YE'ê tehrîm xiste ser 5 kesên pêwendîdar bi pilana terora balyozê Erebistanê

Yekîtiya Ewropayê di daxuyaniyekê de (21.10.2011) ragihand ku 5 kes li pêwendî li gel terhê terorê balyozê Erebistanê de xiste nav lîsteya tehrîman. Pêka vê daxuyaniyê darayî û samana wan 5 kesan tê bilokkirin. Navên wan 5 kesan pêk hatiyê ji: Mensûr Erbabseyar, welatiyê Îranî-Amerîkayî, Xulam Şekûrî, terahê terorê, Hamid Ebdullahî, yek ji Fermandehên Sipaha Quds a Pasdaran, Ebduriza Şehlayî, endamê Sipaha Quds û Qasim Silêmanî, Fermandeyê Sipaha Qudsê.

Hefteya borî Amerîka, Birîtaniya û Kanadayê jî ew 5




kes xistin bin tehrîman.

Ev gava han di pêvajoya xebata li dijî terorîzmê ye ku Komara Îslamî a Îranê pêşengiya terorê dike.

